Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :994 | 7-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Wênesazek Di Hembêza Çiyayê Şengalê De

**Hunermendê ciwan, wênesaz Diham Şengalî di hembêza Çiyayê Şengalê de heqîqeta civaka Êzidî xêz dike û li ber tîrêjên rojavabûnê dibêje: "Ez li Çiyayê Şengalê, karekî ku bi çanda me ve girêdayî ye dikim. Wênesazî ji ax, çand û dîrokê ne qut e, em dikarin bibin pirekê di navbera dîroka bav û kalên xwe û civaka xwe ya niha de.''**

Berhemên ku mirov kedê pê de dide pîroz û xwedî wate ne. Wekî beşeke hunerê, wêne jî yek ji wan berheman e ku hestê mirovekî, li ser çarçoveyekê dide xuya kirin. Dema mirov li wêne binêre hestê wênesaz di nava xêzên wêneyê de xwe vedibêjin. Welatparêzî, bi ax û çanda xwe ve girêdayî û bi eşqeke mezin ji karê xwe heskirin. Me ev hemû bi lênêrînekê di nava wêneyê de, wênesaz Diham Şengalî de dîtin.

Dema roj li ber ava bû em ji Kersê ber bi Serdeşta Kolika ve birêketin, li kêleka rê me Diham dît ku li ser kevirekî ji yên Çiyayê Şengalê, raserî Kaniya Pîrexeyê li Geliyê Kersê bi çêkirina wêneyekî ve mijûl bû. Rast e, wî bi xwe wêneyek xêz dikir lê hebûna wî li ser wê cihê ku dîrok, çand û welat hemû bi hev re bibûn yek dixuya. Hebûna li cihekî wisa bi xwe wêneyek e ku hêjayê xelatê herî mezin e.



### 'Ev jî zimanek e ku wêne pê tê xêzkirin'

Diham ji aliyekî ve xêzên dawiyê li wêneyê xwe dikir, ji aliyekî ve ji me re behsa karê xwe kir. Lê ne wek her kesekî diaxivî, wî daxwaza alîkariyê ji rêxistin û welatan nekir, bi gotina "Li cihekî wiha karkirin ji min re her tişt e, ev der cihê bav û kalên me ye" dest bi axaftina xwe kir. Diham da zanîn ku ev 3 sal in vî karî dike, ji karê xwe hez dike û dixwaze li nava civakê de jî bide heskirin. Diham got: "Beriya fermanê jî min ji vî karî hez dikir û dixwest pêş bixim lê giringî bi vî karî nedidan. Wisa kiribûn ku her kesekî vî karî bike pêwîst bû peymangehê bixwîne û wisa dest bi karê wênesaziyê bike. Lê piştî fermanê min bi derfetên xwe ve dest bi vî karî kir, ji ber ku ez pir jê hezdikim. Ev jî zimanek e ku wêne pê tê xêzkirin. Ji bo min rihek e û her bi min re jiyan dike.''

### 'Wêne rêya vegotina êş û azar, xweşî û nexweşiyane'

Wêne ji bo Diham rêya vegotina êş û azar, xweşî û nexweşiyên civakê, fermanên bi sere Êzidiyan de hatî û danasîna çanda kevnar a ji bo cîhanê ye ku bi van hestan tîne ser ziman: ''Li Geliyê Kersê, beramberî Kelehoşkê dema ez wêneyê keçeke Êzidî ku cilûbergên çanda me ya kevnar li ber in xêz dikim, ji min re ji her tiştekî xweştir e û bi nirxtir e. Dema ku behsa Çiyayê Şengalê bê kirin Êzdiyatî li bîra her kesekî tê, dema behsa Êzdiyan jî bê kirin beriya her tiştî Çiyayê Şengalê dikeve bala mirovan. Niha ez wek ciwanekî Êzidî li Çiyayê Şengalê me, karekî ku bi çanda me ve girêdayî ye dikim. Yanî tiştê ku dikeve bala mirovan, em niha di nav de ne.''

### 'Pêwîste civak jî destekê bide hunermendan'

Diham da diyar kirin ku hunermend ne tenê ji bo xwe ye, belkû ji bo tevahiya civakê ye, ji ber wê jî giring e ku civak jî destekê bide hunermendan û wan ber bi serkeftinê ve bibe. Her wiha balkişande ser pêla koçberiyê ku gelek ciwan berê xwe didine derveyî welat û got: "Ez li dijî çûna derve me, heya ku ez li jiyanê bim, ezê herdem hewl bidim li ser axa xwe bim û bi çanda xwe ve, dîrok û Çiyayê Şengalê ve girêdayî bim. Wênesazî jî ji vê ne qut e, bi çand û olê ve girêdayî ye eger mirov baş bikar bîne.''

### 'Em pirek in di navbera dîrok û roja me de'

Diham, wekî hunermendekî ciwan a Êzidî ji bo têkiliya bi ax û dîrokê re jî ev nêrîn anî ser ziman: ''Em dikarin bibin pirekê di navbera dîroka bav û kalên xwe û civaka xwe ya niha de. Ji şûna ez li derveyî welat kar bikim, eger li ser axa xwe li cihekî wekî vê derê kar bikim karê min watedartir dibe.''

Di dawiya axaftina xwe de Diham Şengalî bi van gotinan bang li ciwanên Êzidî kir: "Çiqas zor û zehmetî hebin, lazim e em terka axa xwe nedin û li ser axa xwe kar û xebatên xwe bidin meşandin. Em dibînin ku ev planeke siyasi ye li ser me tê meşandin û dixwazin gelê me ji ax û çanda wan dûr bixin.''

*ROJNEWS*

Sudoku:Bersiv 3

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 6 | 4 | 7 | 3 | 2 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 3 | 5 | 1 | 4 | 6 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 1 | 8 | 9 | 5 | 4 | 3 | 6 |
| 1 | 2 | 3 | 6 | 5 | 7 | 8 | 4 | 9 |
| 6 | 5 | 8 | 4 | 2 | 9 | 7 | 1 | 3 |
| 4 | 9 | 7 | 3 | 8 | 1 | 6 | 2 | 5 |
| 5 | 1 | 6 | 9 | 7 | 4 | 3 | 8 | 2 |
| 3 | 4 | 9 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 1 |
| 7 | 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 9 | 6 | 4 |

Sudoku: Pirs 4

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 7 | | | | 6 | |
| | 5 | | 3 | | 4 | | | |
| | 1 | | 2 | 9 | | | 4 | 3 |
| | 3 | | | | 6 | 1 | 2 | |
| 9 | | | | | | | | 4 |
| | 2 | 1 | 4 | | | | 5 | |
| 6 | 8 | | | 7 | 3 | | 1 | |
| | | | 5 | | 2 | | 9 | |
| | 4 | | | | 8 | | | |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | P | A | N | O | ■ | T | ■ | A | E |
| 2 | ■ | R | A | ■ | C | Î | H | A | D |
| 3 | S | Î | ■ | P | ■ | R | E | ■ | E |
| 4 | S | ■ | M | A | L | ■ | D | A | N |
| 5 | ■ | P | ■ | T | ■ | N | Î | Ş | E |
| 6 | Z | Ê | M | A | R | ■ | S | Ê | ■ |
| 7 | I | R | A | ■ | O | F | ■ | F | A |
| 8 | R | ■ | K | Ê | M | A | R | ■ | S |
| 9 | X | E | ■ | L | A | L | ■ | T | A |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 2 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 3 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 4 | | | | ■ | | | | | ■ |
| 5 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 6 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | ■ | | | | | ■ | | | ■ |
| 8 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 9 | ■ | | | | | ■ | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin... Rengê reşê dibiriqe
2. Baneşana keserê... Muxtar
3. (Ebdulsamet …) Li gorî lêkolînan kesê ku teksta herî pêşî a kurdî di salên 970'yî de nivîsî ye.
4. Sedemkarê tevgerê, paldêr... Mehek
5. Notayek... Ji bo sekinandina ker, hesp û hestiran
6. Cejn, eyd... Ji bo ajotina keran tê gotin... Pirç
7. Li gorî baweriyên olî mirovê ku ewilî ji layê Xwedê ve hatiye afirandin û pêxemberê pêşîn... Peyva neyînî
8. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Ji vir û şûnde, ji niha pê de
9. Bajarekî me... Îrade


**JOR-JÊR**

1. Peywirdarê dojehê
2. Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Parsûyên masiyan
3. Rê û kuçeya ku dawiya wê girtî ye... Edalet
4. Kurtebêja Ksenonê... Beşeke malê, jûr
5. Mêrê ku temenê wî ji pênciyê derbastir bûye
6. Kesê ku li ber aş dimîne û karê hêrandina aşî dike... Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê
7. Baneşaneke gazîkirinê... Paytexta Îtalyayê
8. Sir, tiştê her kes pê nizane... Hevser (mêrê jinekê)... Rojek

## 'Derbeke herî mezin li pergala desthiatdariyê xistiye'

Xalis Misewer : Rêber Apo tevayiya plan û projeyên veşarti yên desthilatdaran derxistiye holê û derbeke herî mezin li desthiltdariyê xistiye, ji ber wê dixwazin bi tecrîdê tola xwe jê hilînin.

***R-4***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 994 | 7-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# DIXWAZE DAGIRKERAN JI XETIMANDINÊ XILAS BIKE



## 'PDK'e ji bo qirkirina Kurdan ji dewleta tirk re derfet ava dike'

Welîda Botî diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser çiyayên azad qirkirina Kurdan e û wiha got, dagîrkeriya tirkî di şerê li dijî hebûna Kurdan de, PDK'ê bikar tine û dixwaze di rêya wan de kurda di qirkirinekê dîrokî de derbas bike. R-5

## Tevî hemû hişyariyan jî PDK'ê xiyaneta xwe dewam dike û êrişî gerîla dike

Di encama êrişeke bi balafireke şer yê dewleta tirkî ya dagîrker ku li gor agahiyan çekdarên PDK'ê istixbarat dayîne, 2 gerîla şehîdbûn û 3'ê gerîla birîndar bûn. Tevî hemû hişyariyên HPG'ê jî, PDK'ê di xiyaneta xwe de dewam dike û ji dagîrkeriya Tirkiyê re dibe amûr. ***R-3***

**RÊVEBERIYA XWESER BÛYE MÎNAKA ÇARESERIYA LI SÛRIYÊ**

Dilyar Cizîrî ***R-4***

**Siwarê Hespê Xelkê Tim Peya Ye..**

Dijwar Ehmed Axa ***R-6***

## Xebatên şaredariyê yên xizmetguzarî bê navber dewam dikin



Hevserokê Desteya Rêbveberiya Herêmî û Ekolojîk Silêman Ereb, diyar kir ku tevî şert û mercên giran ew di xizmeta gelê xwe de amade ne û bi berdewamiya kar û xebata xwe ji êrişên dagîrkeriyê re dibin bersiv. ***R-6***

## Saleke nû ya xwendinê dest pê dike



Li ser sala nû ya xwendinê, Hevseroka Desteya Perwerdê Rohat Xelîl da zanîn ku îsal ji aliyê perwerdekirina mamosteyan ve û çeksazkirina dibistana, heta astekî baş xebitîn. ***R-2***

## Fîlmê Berbû: Dagîrkerî




Derhênera fîlmê Berbû Sevînaz Evdikê diyar kir ku çîroka fîlmê Berbû çîroka sê jina ne û beşek biçûk ji êş û berxwedana jiyana koçbera ye. Herwiha da zanîn ku di vî fîlmî de zilma dagîrkeriya dewleta tirkî ya li ser gel, ji cîhanê re tê ragihandin. ***R-7***

# Piştî qirkirina 107 salan avakirina yekîtiya jinên Ermen

Berdevka Yekitiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan, da zanîn ku jina birêxistinkirî ti caran nayê şikandin û got, emê têkoşîna xurttir bikin û hêza jinên Ermen ji tevayiya cîhanê re îspat bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Derbarê rewşa jinên Ermenî ku qirkirin li ser gelê wan de pêk hatine, herwiha avakirina Yekîtiya Jinên Ermen ya piştî 107 salan, Berdevka Yekitiya Jinên Ermenî Anahîd Qesabiyan ji me re axivî.

**`Di qirkirinên ser gelê Ermenî de herî zêde jin rastî hovîtiyê hat`**

Anahîd qesabiyan behsa rastiya jina Ermenî ya di qirkirinên ku li ser wan pêk hatine kir û wiha got: "Di qirkirinên li ser gelê Ermenî de, jinên Ermenî rastî kuştin, destdirêjî û koçberkirina bi darê zorê hatin û di meşa mirinê de hatin ajotin. Wê demê gelek jinên Ermenî hatin firotin. Piştî ku Ermenî koçberî Mergedayê bûn, komkujî û kiryarên herî hovane li ser destên Tîma Hemîdiyê ya Osmaniyan dîtin. Herwiha tîmên Hemîdiyê bi şevê êrişî kampên me yên li Mergedayê dikirin û jin tecawiz dikirin û ew dikuştin. Bi vê awayî rojane nêzî 500 qurbanî çêdibûn."

**`Piştî şoreşa Rojava jinên ermenî jî xwe bi rêxistin kirin`**

Anahîd anî ziman ku jina Ermenî ji bo ku bi gelên din re bigihêje ziman, çand û mafê xwe, xwe bi rêxistin kir. Herwiha got, piştî lidarxistina şoreşa Rojava jinên Ermen ji aliyê leşkerî, siyasî û civakî ve xwe bi rêxistin kirin û parastina nirxê şoreşê kirin. Da ku dîroka xwe ji nû ve xêz bikin û hêza xwe bidin dîyarkirin.

**Piştî qirkirina 107 salan avakirina yekîtiya jinên Ermen**

Piştî ewqas komkujiyên ku bi serê gelê ermenî de hatin, jinên ermen 30'ê Tebaxê di Konferansa xwe ya yekem de bi dirûşma `Yekîtiya Jinên Ermen piştî qirkirina 107 salan xwe ji nû ve zindî dikin` yekîtiya xwe ava kirin.

Anahîd da zanîn ku pêwîstiya wan bi avakirina yekîtiyeke jinan hebû û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Me pêwîst dît ku pêkhateyên Ermen piştî salên dirêj ji qirkirinê, ji nû ve xwe komî hev bike û bibe yek. Emê bi rêya yekîtiya xwe civakeke demokratîk û azad ava bikin ku tê de tevayiya pêkhateyên Bakur û Rojhjilatê Sûriyê bi aramî bijîn û jinên Ermen di avakirina vê civakê de li hember hişmendiya desthilatdariyê, cihê xwe bigirin."

**`Emê rê li ber zilmê bigrin û nehêlin qirkirinên li dijî jinan dubare bibin`**

Anahîd di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya konferansa wan ya ku berî çend rojan hatibû lidarxistin û wiha got: "Piştî 107 salên ku bi milyonan ermen hatin qirkirin û bi hezaran jin hatin windakirin, firotin û îşkencekirin. Lewra bi jinên kurd yên tekoşîna azadiyê dikin bûyine yek, ji bo me pir girînge. Ji ber ku em û jinên kurd dikarin bi rêxistinekê hevpar li dijî zilm û hovîtiyê doza mafên xwe bikin. Herwiha çanda ermenî belav bikin û urf û edetên xwe bi cîhanê bide nasîn. Ji bo wê jî divê em bi avakirina yekîtiya xwe, rê li ber zilmê bigirin û bi tekoşina xwe re tevahî jinên cîhanê bikêşin tekoşina parastina azadiya jinê."

Anahîd têkîldarî mijarê ku di konferansê de hatin niqaşkirin wiha got: " Pêvîstiya ku zimanê ermenî jî di dibistana de bibe zimanê perwerdeyê, hat niqaşkirin. Dayîna kursan ji bo mezin û zarokan, perwerdekirina jinan ji



aliyê rewşenbîrî ve, hînkirina jinan li ser çekan û hwd hatin niqaşkirin. Herwiha hat niqaşkirin ku jinên ermen jî hêza xwe ya parastinê ava bikin. Herwiha giringiya xurtkirina peywendiyan bi jinên derveyî welat re hat diyarkirin. Da ku tevayiya jinan hêz û îradeya jinên Ermen nas bikin. Xurtkirina tikîliyan bi rêxistinên navneteweyî û mafên mirovan re, da ku li ser dosayên qirkirinê bisekinin û ji sûcdaran hesab bê xwastin. Herwiha li ser parastina jinên Ermenî ji zîhniyeta baviksalarî û parastina mafên jinan di nava malbat û civakê de hin nîqaş hatin kirin.

**`Jina birêxistinkirî ti caran nayê şikandin`**

Anahîd destnîşan kir ku Ev konferans dê bibe gava yekem ji bo vegerandina çanda Ermenî û balkişandina ser hêza jinên ermenî ya birêxistinkirî. Heriwha got, jina birêxistinkirî ti caran nayê şikandin, ji bo wê jî emê têkoşînê bikin û ji tevayiya cîhanê re îspat bikin ku em Ermenî hene û emê li ser axa xwe bimînin. Çi dibe bila bibe hêza me serkeftina me ye.



**`Yekîtiya jinên Ermenî emcama xebata bi sala ye`**

Anahîd da zanîn ku Yekîtiya Jinên Ermenî di encama xebateke bi salan de pêk hatiye û vê xebatê girîngiya xwe ji bo jinên Ermenî nîşan da ye û wiha axiftina xwe domand: "Avakirina yekîtiyê, ji bo me gaveke girîng bû ku em jin li dîroka xwe vegerînin û xwe ji nû ve ava bikin. Herwiha ziman, dîrok, çand û folklora ermeniyan ya ku dagirkeriya Tirk hewl da têk bibe biparêzin."

**`Li dijî dagîrkeriyê refên xwe bikin yek`**

Anahîd di dawiya axaftina xwe de avakirina yekîtiya jinên Ermen li tevayiya jinan bi taybet li jinên Ermenî pîroz kir û bang li jinan kir ku li dijî dagirkeriyê, refên xwe bikin yek. Ji bo ku qirkirina 107 salan dubare nebe. Herwiha got, îro em xwedî biryar in, ji bo wê jî emê rê nedin ku dagirkerî, komkujiyên xwe yên li ser me û mafê gelên herêmê dubare bike.

## YPJ'ê û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn serdana keça êzîdî ya rizgarkirî kir

**Şandeyeke YPJ'ê û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn serdana keça êzîdî ya bi navê Wefa Ebas ku ji Kampa Holê hatiye rizgarkirin kir. Wefa ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve dema 9 salî bû hatibû revandin.**

Di qonaxa duyemîn ya "Pêngava Ewlehî û Mirovî" de ya ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn di 25'ê Tebaxê de bi piştgiriya QSD, YPG û YPJ'ê dest pê kiriye, jineke êzîdî hat dîtin û gef lê hatibû xwarin ku nasnameya xwe eşkere neke.

Di vê çarçoveyê de, şandeyeke YPJ'ê û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, serdana keça êzîdî Wefa Ebas ya li kampa Holê kir. Di serdanê de fermandara Meclisa Leşkerî ya herêma Cizîrê, Evînar Dêrik wiha axivî: "Me keça êzîdî Wefa Ebas di dema Pêngava Ewlehî û Mirovî de dît, lê gef lêhatibû xwarin ku nasnameya xwe eşkere neke."



Evînar Dêrik wiha domand: "Ev ne cara yekem me û ne jî keça yekem me ku ji çeteyên DAIŞ'ê tê rizgarkirin. Ji destpêka şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve, ji bo rizgarkirina jinên êzidî xebatên mezin ji Reqa heta Şengalê hatin kirin û bi dehan keç hatin rizgarkirin."

Evînar Dêrik diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê bi van kiryarên li dijî jinên êzidî hewl didan ku wan ji nasname û dîroka wan dûr bixin.

Her wiha, keça rizgarkirî Wefa Ebas wiha axivî: "Ez bi rizgarkirina xwe ji çeteyên DAIŞ'ê pir kêfxweş im, spasiya YPJ'ê dikim ku ez rizgar kirim. Min soz da xwe ku heta ez negihêjim malbata xwe ya li Şengalê, ez cilên xwe naguherim." Keça êzidî Wefa Elî Ebas ku niha 18 salî ye, di 9 saliya xwe de bi xwişka xwe ya ker û lal (13) re, ji gundê Koco yê Şengalê ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatin revandin û vê dawiyê jî di Pêngava Ewlehî û Mirovî ya li Kampa Holê de ji aliyê şervanên YPJ'ê ve hat rizgarkirin. ***ANHA***



# Fîlmê Berbû: Dagîrkerî

Derhênera fîlmê Berbû Sevînaz Evdikê diyar kir ku çîroka fîlmê Berbû çîroka sê jina ne û beşek biçûk ji êş û berxwedana jiyana koçbera ye. Herwiha da zanîn ku di vî fîlmî de zilma dagîrkeriya dewleta tirkî ya li ser gel, ji cîhanê re tê ragihandin.

**Dilîn Ehmed/Dêrik**

Gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî gelê Kurd, bi Şoreşê re êdî di her qada jiyanê de berhemên xwe derxistin holê. Di qada siyasî, civakî û bi taybetî di qada çandî de, pêşkeftinên mezin bi dest xistin. Berî Şoreşê di dilê Kurdan de mabû hesret ku di sînemayekê de li fîlmekî kurdî temaşe bikin. Herwiha nivîskarên Kurd jî nedikarîn nivisên xwe yê bi zimanê dayîkê, pêşkêşî civak û cîhanê bikin. Niha bi saya projeya Netewa Demokratîk û xwîna şehîdan, li tevayî navendên çandê de ku beşa sînema jî yek ji wan e, fîlm, şano û govendên çanda Kurdî têne pêşkêşkirin.

31`ê Tebaxê li navenda Çand û Huner ya Dijle ya bajarê Dêrikê, fîlmê sînema ku li Rojava hat çêkirin, bi tevlîbûna gelê bajêr û lîstikvanan bi kelecaneke mezin, fîlmê Berbû hat Pêşandan. Mijara Fîlmê Berbû, çîroka sê jinên bûk di dema dagirkirina bajarê wan dibêje.

Bi temaşekirina fîlm re hestên ku koçberên bi darê zorî ji xaka xwe hatîn derxistin, zîndî dike. Herwiha li hemberî êriş û dagîrkirina dewleta tirk, berxwedan, girêdana gel ya bi xaka xwe re, hat zîndîkirin.

Derhîner û nivîskara fîlîm, Sevînaz Evdikê ye. Sefînaz ji Serê Kaniyê ye û ji 2016`an ve, di Komîna Fîlm ya Rojava de cihê xwe digire.

Sala 2019 sanaryo ya fîlm qediya û di 2020'an de Komîna Fîlm ya Rojava dest bi kişandina dîmenê fîlm kirin. Kişandina fîlm du mehan dirêj kir.

Têkildarê mijarê Endama Komîna Fîlm a Rojava û derhênera fîlmê Berbû Sevînaz Evdikê, lîstikvan Barîn Reşo û Rozelîn Îbrahîm ji rojnameya me re axivîn.

Derhêner Sevînaz Evdikê diyar kir ku armanca wan ji çêkirina fîlmê Berbû ewe ku, êşa gel ya ji ber dagîrkirina dewleta tirk ji xaka wan re û zehemetiyên koçberiya wan, ji cîhanê re parve bikin.

**`Cihê ku berxwedanî hebe hêza jinê jî heye`**

Derhêner Sevînaz axaftina xwe wiha domand: "Fîlmê Berbû, beşek pir biçûke ji çîrokên koçberên Serê Kaniyê. Lewra êşa dagîrkirinê pir mezin bû, lê li hember wê jî berxwedaniyek pir mezin jî hebû. Armanc ji fîlmê Berbû jî ewe ku ez



beşek ji çîrokên gelê Serê Kaniyê, bi taybetî çîroka jinan zîndî bikim, lewra yên ku herî zêde di rewşên şer de zerarê dibîne jin in. Ji bo wê min xwest bi rêya vî fîlmî, çîroka sê bûkan pêşkêşî cîhanê bikim."

Herwiha Sevînaz da zanîn ku dema dest bi nivîsandina sanoryoya fîlm kir, di despêkê de bandora kef û şerê teybet yê li ser gel, destgirtiye. Herwiha da zanîn ku piştî bajêr ji aliyê dewleta tirk ya faşîst ve hatî dagîrkirin, sanaryo ya fîlmê dirêj bûye.

Li ser zehmetiyên çêkirina film, Sevînaz diyar kir ku ji ber bandora nexweşiya Korona dema çêkirina fîlm 2 salan dirêj kiriye. Herwiha da zanîn ku wan ji aliyê derfetên teknîkî de jî pir zehmetî kişandîne. Sevînaz axiftina xwe wiha domand: "Ji bo kişandina hin dîmenan em neçar bûn ku koçberên xwe yên Serê Kanê ku di kampande bi cih bûne, tevlî nava fîlîm bikin. Ev yek ji aliyê me jî, ji aliyê wan ve jî pir zehmet bû. Ji ber ku careke din birînê wan vedibû, careke din ew roja reş dihat berçavên wan û pir hestiyar dibûn."

**`Bi hêvîme fîlm bi dilê we be`**

Endama Komîna Fîlm aRojava Sefînas Evdikî li ser girîngiya çanda fîlman û çalakiyên çandê, axaftina xwe wiha bidawî kir: "Em wek sînemager dixwazin gelê me li fîlman temeşe bikin, çanda sînemayê belav bibe. Lewra di riya çalakiyên çandî de mirov dîrok û êşa gelê xwe ji cîhanê re tîne ziman û ez spasiya




hemû kesê ku bi me re bûn alîkar dikim. Lîstikvan, dîmenkêş û ekîba heyî hişt ku ev fîlîme bi serkeftî bê çêkirin û pêşkêşkirin û em wek ekîb bi hêvîne ku fîlm bi dilê gelê me be."

**`Nehêlin ti kes di heqê we de biryara bistîne, hûn xwedî biryar bin`**

Lîstikvana bi navê Rozelîn Ibrahm ku di fîlm rola endama Yekineyên Parastina Jin (YPJ) cihê xwe girtibû, diyar kir ku di fîlm de hêza jin ya di hemû qadên jiyanê de hat diyar kirin û axaftina xwe wiha domand: "Di film de çîroka sê jinên bûk tê



destgirtin, rola min jî xwîşka bûkekê ji wan ne. Ji xwe yê fîlm temaşe bike wê bibîne ku jin ji her alî hêz û moral dide derdorê xwe. Di rêya vî filmî de civak cardin tê şiyarkirin ku jin îrade û hêza civakêye û xwedî bîryara jiyana xwe ye."

Rozelîn da xuyakirin ku rola her jinekê di fîlîm de serpêhatiyeke rastya jinekê ye û got, me di fîlm



de hest dane diyarkirin ku, jin divê bizanibe ku li her cih û rewşê de xwedî îrade û biryare, divê biryara jiyana xwe nehêle di destê ti kesê de. Herwiha jin di her tekoşinê de bûye hêza berxwedan û serkeftinê."

Rozelîn Îbrahîm di dawiya axiftina xwe de got, çalakiyên çandî bi taybetî çêkirina rêzefiliman pir girîneg e. Lewra mirov di riya fîlman de êşa civaka xwe dikare bîne ziman. Çimkî çand û huner neynika civaka xwe ye.

**`Me rastiya jiyana xwe di fîlm de dît`**

Li ser heman mijarê Barîn Reşo jî ku di fîlm de rola bûkê lîstiye wiha axivî: "Di fîlm de ez bûka ku kêfa wê negiya serî, bûm. Ez wek kesayet wiha dibêjim ku rola me lîstî, rastiya ku em niha jiyan dikin e. Di rewşa şer de hertim ya ku êşê dikşîne û di heman demê de hêzê dide derdorê xwe, jin e. Lewra jin dayîke, xwîşke û heval e. Di fîlmê Berbû de jî hêza jinê ji civakê re tê diyar kirin ku jin dikare her karî bike, çandî, siyasî û civakî. Nameya ku em dixwazin bigihînin civakê ewe ku cihê jinê ne karê malê ye. Ji xwe şoreşa Rojava bi tekoşina jinê ava bû."

Hejayî bîrxistinê ye ku ji ber ku fîlm li bajarê Dêrikê hatibû çêkirin cara yekê li wir hat pêşandan û hatiye plansazkirin ku fîlm li hemû bajaran were pêşandan.

## 'Dika Şewitî' Ya Tebqayê Beriya Festîvalê Vedibe

**Komîteya Çand û Hunerê ya Tebqayê xebatên sererastkirina 'Dika Şewitî' didomîne. Tê payîn ku Festîvala 1`emîn a Stranan li ser vê dikê were lidarxistin.**

Dika Navenda Çand û Hunerê ya Tebqayê yan jî mîna ku şêniyên Tebqayê wê bi nav dikin 'Dika Şewitî', yek ji dikên herî mezin a li Sûriyê ye. Piştî ku Artêşa Azad herêm kontrol kir, di encama êrişeke hewayî ya hikumeta Şamê de di 19`ê Sibata 2013`an de beşeke mezin a dikê şewitî û ji ber wê şêniyan ev nav lê kir.

Navenda Çand û Hunerê ya Tebqayê sala 1979`an hate avakirin. Tê de yek ji mezintirîn dikên li Sûriyê sala 1982`yan hat avakirin û sala 1993`yan navend bi awayekî fermî hat vekirin.

Di çarçoveya hewldanên Komîteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk de ku dikê ji nû ve sererast bikin, komîteyê dest bi xebatên restorekirinê kir.

Li gorî hevserokê Komîteya Çandê ya Tebqayê Elî El Eleya, xebatên restorekirin û sererastkirina dike,



yek ji projeyên herî girîng ên komîteyê yên sala 2022`yan bû. El Eleya wiha domand: "Ji zêdetirî mehekê ve, me dest bi van xebatan kiriye, hindik maye xebatên me bi dawî bibin.

Her wiha El Eleya destnîşan kir ku lêçûna vê projeyê derdora 135 hezar dolar e û divê xebatên sererastkirinê di 2 mehan de bi dawî bibin û da zanîn ku di çend rojên bê de dê ev xebat bi dawî bibin.

Der barê xebatên sererastkirinê de El Eleya ev agahî parve kirin: "Me pergala ronîkirin û deng ên nû lê bar kirin. Tablo li dîwarên wê bi cih kirin. Di pêvajoya bê de dê 200 kursî werin bicihkirin."

El Eleya hewldanên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê silav kir ku bi rêya komîteyên hunerî hewl dide hemû navendên çandê vejîne û asta zanabûna hunerî ya herêmê bilind bike.

Di dawiyê de El Eleya got: "Amadekarî tên kirin ku Festîvala 1`emîn a Stranan li ser vê dikê were lidarxistin. Dê gelek hunermend û stranbêj ji herêmên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev lê bibin." ***ANHA***

# Xebatên şaredariyê yên xizmetguzarî bê navber dewam dikin

**Hevserokê Desteya Rêbveberiya Herêmî û Ekolojîk Silêman Ereb, diyar kir ku tevî şert û mercên giran ew di xizmeta gelê xwe de amade ne û bi berdewamiya kar û xebata xwe ji êrişên dagîrkeriyê re dibin bersiv.**

**Darîn Silê/Qamişlo**



Di şoreşa Rojava de bi avakirina Rêveberiya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê, desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk ya herêma Cizîrê, hat avakirin. Desteyê Ji wê demê ve gelek projeyên xizmetgûzarî li herêmê pêk aniye û heta niha jî bi awayekî rêxistinkirî xizmeta gelê herêmê dike, kar û xebata xwe ya resen didomîne. Desteyê her sal projeyan pêk tîne û hewl dide ku li herêmê xizmetgûzariyê xurttir bike. Niha jî tevî rewşa awarte, êriş û kiryarên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, xebat û projeyên xizmetguzariyê yên sala 2022`an dewam dikin û dibe bersiva êrişên dagîrkeriyê.
Derbarê dewama xebatên xizmetguzariyê li herêma Cizîrê û pêkanîna gelek proje û planên sala 2022`an, Hevserokê Desteya Rêbveberiya Herêmî û Ekolojîk, Silêman Ereb ji me re axivî û behsa rewşa xizmetguzariyê li herêmê kir.

### `Emê berdewamiya projeyan bikin`

Silêman Ereb da zanîn ku wan ji projeyê îsal ji sedê 60 pêk anîne û axaftina xwe wiha domand: "Projeyên xizmetguzariyê li seranserê herêma Cizîrê pêk tên, taybet projeya ziftê ku li Qamişlo, Hesekê, Amûdê, Dirbêsiyê, Til Temir û Dêrikê pêk tê. Ji destpêka salê ve me dest bi pêkanîna projeyên xwe kiriye, heta niha jî em berdewamiya wan dikin. Me gelek proje weke ya ziftê, Serif Sihî, çandina daran, peydakirina avê û ronîkirina kolanan pêk anîne. Me projeya ronîkirinê bi dawî kiriye, lê yên din hê em berdewamiya wan dikin."

Herwiha Silêman got, Ji ber ragihandina rewşa awarte, hin projeyên taybet û projeya çêkirina cihekî ji bo avêtina çopê li bajarê Hesekê, hê me dest pê nekiriye, di demekê nêz de emê dest bi wan jî bikin.
Silêman Ereb da xuyakirin ku yek ji projeyên herî girîng ku di vê salê de pêk anîne, projeya li ser zarokên sêwî bû û wiha got: "Me navendek ji bo zarokên sêwî li ser asta herêma Cizîrê ava kir. Armanca me ji vê navendê ew bû ku, em tevayiya zarokên bê dê û bav, herwiha yên ku di şer de dê û bavê xwe winda kirine, bihewîniin û xwedî li wan derkevin. Da ku ev zarok li kolanan nemînin û di paşerojê de bikaribin parastina xwe bikin. Ji bilî vê jî, niha em malek ji bo jinên bê derfet ava dikin. Lê hê me bi dawî nekiriye û wê di demek nêz de bi dawî bibe."

### `Projeya ronîkirinê rehetiyeke mezin di nava gel de da çêkirin`

Silêman Ereb behsa projeya ronîkirinê kir û wiha pê da çû: "Projeya ronîkirinê pir girîng bû û rehetiyeke mezin di nava gel de da çêkirin. Ji bo wê jî me ev projeye





bi armanca ewlehî û hêsankirina tevgera welatiyan li herêmê pêk anî. Ev proje li herdû kantonên Qamişlo û Hesekê pêk hat û bi dawî bû."

Silêman di derheqê mesref û çawabûna 'pirojeyê ronikirina rêyan' de ev agahî dan: "Di vê projeyê de 297 stûn hatin danîn û lêçûna wê gihişt derdora 403 hezar dolar: Li aliyê rojavayê bajarê Qamişlo de jî stûnên ronîkirinê ji çerxerêya Osman Sebrî heta taxa Hilêliyê bi dirêjahiya 2,5 km hatin danîn. Li aliyê rojhilatê bajar jî stûn ji çerxerêya Şehîdên Enternasyonalîst heta çerxerêya Elaya bi dirêjahiya 2,2 km hatin danîn. Li bajarê Hesekê jî ji çerxerêya Panorama heta Pira Xiwêran bi dirêjahiya 3, 5 km, her wiha ji çerxerêya Cûdî heta çerxerêya Kelasê bi dirêjahiya 800 metre stûn hatin danîn."

### `Rola gel di tevayiya projeyan de heye`

Silêman Ereb bal kişand ser rola gel di warê xizmetguzariyê de û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Rola gel di tevayiya projeyan de heye. Ji ber ku tevahiya projeyên xizmetguzariyê ji bo gel tên çêkirin. Gel bi me re dibe alîkar û keyfxweşiya xwe di pêkanîna projeyan de diyar dike. Em bihêvîne ku di her alî de gelê me bi me re alîkar be. Her kes dibîne em di rewşeke awarte de ne, rojane êriş ji aliyê dagirkeriya Tirk ve li ser me tên kirin. Lê me karê xwe berdewam kir û em xizmeta gelê xwe dikin. Ev yek jî hêza me û ya Rêveberiya Xweser diyar dike."


### `Ji ber ambargoyê em zehmetiyê di peydakirina alavan de dibînin'

Silêman Ereb têkîldarî zehmetiyên ku bi wan re derbas dibin jî wiha got: "Piraniya zehmetiyên ku em dikşînin ji ber kiryar û êrişên dagîrkeriiya tirkî ne. Herwiha ji ber ambargoya li ser herêmê jî em zehmetiya di peydekirina alavan de dibînin. Hin caran em zehmetiyan di peydekirina kesên pispor de jî dikşînin. Lê tevî zehmetiyan karê me berdewam e û em hewl didin xizmetguzariyê li herêmê pêş bixin."

### 'Çiqas rewş zehmet be jî emê kar û xebata xwe bidomînin'

Silêman di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku heya 2-3 heyvên din, ewê proje û planên xwe yên salê bi dawî bikin.
Hevserokê Desteya Rêbveberiya Herêmî û Ekolojîk, Silêman Elî Ereb di dawiya axaftina xwe de banga gel kir û got, tevî şert û mercên giran em di xizmeta gelê xwe de amade ne. çiqas rewş zehmet be jî emê kar û xebatê bikin û berxwedanê xurt bikin. Em banga gel û ciwanên xwe dikin ku berê xwe nedin walatên xelkê û koçberiyê, li kêleka rêveberiya xwe parastina destkeftiyên heyî bikin.

## Tîr



### Siwarê Hespê Xelkê Tim Peya Ye..

**Dijwar Ehmed Axa**

Xwendevanên hêja, di dîroka gelê me de, gelek serpêhatî hene, yek ji wan dibêje, du kes di rêkê de bi hev re bûn heval, yek xorte yê din jî kal e kal. Kalo ji êla şêrwana bû, xort ji êla bohtiya bû, herdû êl dijminên hev bûn. Kalo ji xort re got: "xwarzê ka emê ji xwe re bazarekê bikin, emê bi rê de birçî bibin, em dest bi xwarina barê te bikin, dema xelas bû emê dest bi xwarina barê min bikin." Xort qebûl kir. Welhasil dest bi vexwarina dimsa barê xort kirin ta nema, wê gavê xort ji kalo xwest ku dest bi xwarina barê wî bikin, kalo di bin çavan lê nerî û got: "Dema hebû dims, ez mam û ti pis, gava nema mohtî (navekî dimsê ye) ez şêrwan û ti bohtî.

Îca ka em bên ji xwe re li Opozisyona Sûrî û dewlet tirk ya dagirker û bi taybet li Erdogan binêrin. Erdogan ji destpêka xwepêşandanên gelê Sûriyê li Dera û piştre li Şam, Hims, Hema, Helebê, ji gelê Sûrya re got, 'ez bi were me, ez li pişta we me, çi ji me bê xwestin em hazirin; emê alîkarya we bikin û rêjîma Esed hilweşînin.' Welhasil ev gel ber bi şer de dehf da, çek û pere bi ser kesên qaşo xwe wek berpirsên şoreşa gel didîtin rijand û bi pereyan ew kirîn, kirin xulam û peyên xwe. Têra xwe ew ji bona berjewendiyên xwe bikaranîn, kirin çete û şandin Lîbya, Azerbeycan, Iraq, Ukranya, û her dera ku ihtiyaca wî lê hebû.

Lê dema ku karê wî bi wan nema û berjewendiyên xwe bi wan qedandin, eşkere diyar kir ku ewî şaş kir û gerek opizisyon û Rêjîm li hev werin û ev meseleya di nava wan de bê çareserkirin!

Wey gidî ev çibû lawo? Çi bi serê wan kir! Wezîrê karê derve ev yek zelal kir û got: "Min hevdîtinek kurt bi wezîrê derve yê Sûrya re li ser darêniga çêkir". Piştre Erdogan bi xwe axivî û got, xwesteka me çareserkirina alozya Sûrî ye, ne hilweşandina rêjima Esed e. Bê lomebe, ya sitar, van çi bi serê xwe kir! Weke xortê Bohtî li xwe kirin, Kaxetên xwe tev şewitandin, hey xwelî li sera, ka hûnê çi bikin û bi kude herin feqîr hala. Mane va Tirko xwe ji pişta we da alî piştî ku henekê xwe bi we kir, hevdîtina we ya dawî bi wezîrê derve "Çavişoglu" re ji were eşkere kir. Divê hûn ji xwe re cihekî din bibînin, eger hûn li cem tirka bimînin dibe ku we radestî Hikûmeta Şamê bikin. Lê ya ku mirov lê ecêbmayî dimîne, ewe ku hîn ev kes û bi taybet nûnerên ENKS ê di nav wan de, parastina Rêjîma Tirkan dikin û di bêjin, ji mafê dewletê ye ku parastina berjewendiyên xwe bike. Ê baş e, Tirk dewletin û ji mafê wane parastina berjewendiyên xwe bike, lê ka berjewendiyên gelê Sûryê ku we idîa dikir hûn temsîlcyê wan e, li ku man! Hûn bi qedrê Xwedê kin ji min re rastî bêjin, we di tevahiya cîhanê de ti opozisyon ditine ku li dijî rêjîmekê rabe û têkeve hewldanên têkçûna wê rêjîmê. Lê berovajî wê alikariya rejîmê bike ku di desthilatdariya xwe de berdewam bike, weke ku opozisyona Sûrî dike.



# Tevî hemû hişyariyan jî PDK'ê xiyaneta xwe dewam dike û êrişî gerîla dike

**Di encama êrişeke bi balafireke şer yê dewleta tirkî ya dagîrker ku li gor agahiyan çekdarên PDK'ê istîbarat dayîne, 2 gerîla şehîdbûn û 3'ê gerîla birîndar bûn. Tevî hemû hişyariyên HPG'ê jî, PDK'ê di xiyaneta xwe de dewam dike û ji dagîrkeriya Tirkiyê re dibe amûr.**

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

Tevî ku Fermandariya Biryargeha NPG'ê di 28'ê Tebaxê de bi daxuyaniyekî hişyarî dabû PDK'ê ku riyan ji dewleta tirkî re veneke û nebe hevkarê êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser qadên Gerîla, di şeva 5'ê Îlonê de dema komek gerîla xwestin ji herêma Xelîfanê derbasî herêmek din a gerîla bibin , çekdarên PDK'ê yên li herêmê îstîxbarat dane balafira deweleta tirk ya dagîrker û wê jî bi êrişeke hovane Koma gerîla kiriye armanc, di encamê de 2 gerîla şehîd bûne û 3'ê gerîla jî birîndar bûne.

Desteyên ragehendinê yên girîdayî dewleta tirkî êrişa PDK'ê ya ser gerîlayan piştrast kirin. Herwiha ragehandina PDK'ê jî diyar kirbû ku di encama êrişeke de 2 gerîla şehîd bûne û 4 jî birîndar bûne û ketine destên hêzên PDK'ê.
Herwiha desteyên çapemeniya girêdayî PDK'ê ragehandibû ku ji çekdarên PDK'ê ti kes birîndar nebûyî ne.

Hêjayî gotinê ku ev ne cara yekê ye ku PDK'ê êrişî herêmên gerîla dike, di encama kemînên çekdarên PDK'ê de di salekê de 11 gerîla şehîd bûn e.



# Projeya guhertina demokrafiya Efrînê berfireh dibe

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

**Bi armanca guhartina demografîk li kantona Efrînê ya dagirkirî, dewleta tirk ya dagîrker û rêxistinên Îxwanî, projeya avayiyeke mêtingehiyê li navçeya Cindirêsê, hê jî berdewam me. Herwiha dewleta tirk û rêxistinên algirê wê, projeyê berfireh dikin.**

Di çarçoveya guhartina demografiya kantona Efrîna dagîrkirî de, rêxistinên Îxwanî yên bi navên "Xeyrî" û bi fermana yekser ji dewleta tirk ya dagîrker jib o berfirehkirina piojeya avayiya mêtingehiyê, dixebitin.
Saziya 'Wefa El Muhsenîn' avahiyek ku ji 34 malan pêk tê, li navçeya

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê da xyuakirin ku di çalakiyên gerîlayan de yên di ê Îlonê de hatine'٦-٣ navbera dagirker ١٥ lidarxistin, herî kêm hatine cezakirin û wesayîteke .leşkerî jî hatiye têkbirin
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyeke nivîskî de diyar kir ku Gerîlayên azadiya Kurdistanê li her derê derbeyên

Cindirêsê ya Efrînê ava kir û koçberîn pêkhateyên ereb yên ne xwedî cih, di wan avayiyan de bi cih didikin.

Herwiha saziyê beriya çend hefteyan ve dest bi avakirina duyem ya avayiyê mêtingeriyê ku ji 80 malî pêk tê kiriye.

Armanca dewleta tirk ya dagîrker



û komên Îxwanî (Îxwan Muslimîn) ji avakirina avahiyên mêtingehiyê diyare, ew dixwazin cihkirina koçberên nexwecihî, nasnameya kantona Efrînê ya resen biguherînin.

Herwiha piraniya koçberên di

# HPG: 15 dagirker hatine cezakirin

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê da xyuakirin ku di çalakiyên gerîlayan de yên di navbera 3-6'ê Îlonê de hatine lidarxistin, herî kêm 15 dagirker hatine cezakirin û wesayîteke leşkerî jî hatiye têkbirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyeke nivîskî de diyar kir ku Gerîlayên azadiya Kurdistanê li her derê derbeyên giran li artêşa dewleta tirkî ya



dagîrker dixe.
HPG'ê da zanîn ku di 8 çalakiyên hêzên wan de 15 dagirker hatine cezakirin, dagirkerek jî bi giranî birîndar bûye. Herwiah HPG'ê diyar kir ku di heman demê de wesayîteke leşkerî ya Kîrpî, pergaleke kamerayê ya mobese û 60 kîlo teqemenî hatine îmhakirin.
HPG'ê ragehand ku artêşa Tirk a dagirker 13 caran bi bombeyên taktîk nukleer û çekên kîmyewî, 24 caran bi helîkopterên êrîşê, 12 caran jî bi balefirên şer û bi dehan caran jî bi obus, hawan û çekên giran Qadên Berxwedanê bomberdûman kiriye.

# 23 çeteyên DAIŞ'ê yên din jî hatin girtin

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

**Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê ragehand ku di roja 11 û 12'an ya pêngava Mirovî û Ewlehiyê de , 23 çeteyên şaneyên DAIŞ'ê hatina girtin û 7 xendeq , 8 cihên perwerdê û işkencekirinê jî hatin dîtin.**

23 endamên ku şaneyên DAIŞ'ê hatin girtin û 6 ji wan jin bûn. Herwiha da xuyakirin ku di encama lêgerînê de 7 xendek hatin dîtin û 8 cihên ku şaneyên DAIŞ'ê ji bo perwerde û îşkenceyê bikar dianîn jî hatin rakirin.




Navenda Ragehandina Hîzên Ewlekariya Hundirîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê bêlançoya roja 11'an û 12'an ya pêngava Mirovî û Ewlehiyê bi daxuyaniyekê eşker kir. Hêzên Ewlekariya Hundirîn ragehand ku di xebatên lêgerîn û teftîşê yên rojên 11 û 12'an yên pêngava Mirovî û Ewlehiyê de, Hêzên Ewlekariya Hundrîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê da zanîn ku hêzên wan 4 bombeyên destan, 388 fîşek, 3 cercûrên çeka keleşînkov, 4 çenteyên leşkerî, hejmarek ji xetên peywendiyê, kartên mîmorî û laptopek yên ku ji aliyê çeta ve di binê erdê de hatibûn veşartin, desteser kirin.

# 'Derbeyê herî mezin li pergala desthiatdariyê xistiye'

Xalis Misewer : Rêber Apo tevayiya plan û projeyên veşarti yên desthilatdaran derxistiye holê û derbeke herî mezin li desthiltdariyê xistiye, ji ber wê dixwazin bi tecrîdê tola xwe jê hilînin.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Di navbera hêzên desthilatdar û hêzên civakî yên ku xwestine hebûna xwe ya civakî biparêzin, herdem têkoşînek heye. Kesên ku ji civakê re ji bo vê armancê pêşengî kirine, bûne armanca hêzên desthilatdar. Ji ber hêzên desthilatdar dizanin ku bi têkbirina pêşengan, wê bikaribin civakê bixin bin destên xwe. Yek ji van pêşanga jî Rêber Apo ye ku ji bo azadiya gelê kurd dest bi tekoşînekê bêhempa kir û bi pergala xwe ya Netewa Demokrat ji bo gelên bindest û azadixwaz bû hêviya serkeftinê. Li hember vê tekoşina azadiyê ku roj bi roj belavê cîhanê dibû, dewletên hegemon bûn yek û di encama komploya 1999'an de ku bi 'Komploya Navnetewî' tê bi navkirin, Rêber Apo dîl hat girtin û ev 24 sale di gîrtîgeha



Îmraliyê de tê tecrîtkirin.
Gotina "Çala Mirinê" ji aliyê Rêber Apo ve hatiye bikaranîn. Ev pênase ji bo girtîgeha li girava Îmraliyê hatiye gotin. Ev girtîgeh li giraveke Tirkiyê , di sala 1935'an de ji bo tecrîdkirina mirovan hatiye çêkirin. Di sala 1961'ê de jî serokwezîrê Tirk Adnan Menderes li vê girtîgehê hat bidarvekirin û derhênerê Kurd Yilmaz Guney jî demekê li vê giravê hat ragirtin. Herî dawî jî Rêber Apo di sala 1999'an de dîl hat girtin û ji wê rojê ve li wê derê tê tecrîdkirin. Rêber Apo li ser hêzên ku vê girtîgehê birêve dibin gotiye, 'Îmrali girêdayî Emerîka û Awrûpayê ye û dewleta Tirk jî nobedariya wê dike'.

Armanca pergala desthilatdar ji **tecrîda Rêbertiyê çi ye?**

Derbarê mijarê de nivîskar û rewşenbîrê Kurd Xalis Misewer ji me re ev nirxandin kir: "Siyaseta qirkirinê ya dewleta tirkî ya dagîrker ku bi hevkariya hêzên kaptalîzmê li ser Kurdan dimeşn e, di demên dawî de berbiçav



bûyî. Hemû hêza xwe bi kar tîne û li her qadê şerekî taybet dike. Dagîrkeriya Tirkî êrîşên xwe di şexsê Rêber Apo de li dijî gelên azadixwaz pir zêde kirine û bi vê bingehê pergala êşkence û tecrîdê li ser Rêber Apo girantir dike. Herwiha girêdayî tecrîdê, artêşa tirk ya dagîrker di mehên dawî de li ser Qadên Parastinê yên Medyayê û bi tabet li Metîna, Zap û Avaşînê , êrîşên qirkirinê didomîn e. Li her aliyê Kurdistanê bi armancgirtina şervanên azadiyê dixwaze hêza tevgera Azadiyê qels bike. Bi tecrîd û qelskirina Tevgera Azadiyê dixwaz e qirkirina Kurdan bi rengekî rehet û zûtir pêk bîn e. Hin xwefiroşên ku qaşo dibêjin em Kurdin jî ,bûne xulamên dagîrkeran û destekê didin wan."

**'Felsefeya Rêber Apo rizgariya giştî mirovahiyê ye'**

Xalis Misewer diyar kir ku hêzên qapîtalîzmê gelek serok û rêber bi xefik û planên xwe yên hovane ji holê rakirin e, lê li hember Rêber Apo bi ser neketin û wiha domand: "Hêzên desthilatdar dizanin hêza ku Rêber Apo di nava gel de avakiriye, wê rê nede planên qirêj. Dizanin girseya Rêber Apo çiqas mezin e. Ne tenê Kurd, eger di nava rastiya tevgera PKK'ê de jî em binêrin, diyar dibe ku ji destpêka avakirina tevgera Apocî heya roja îro ji pir neteweyên cûda jî tevlî nava refên şoreşê dibin. Ev yek dide nîşandan ku tevgera Rêber APO ji destpêkê ve bûye tevgera gelan. Ji ber felsefeya Rêber Apo ya jiyana azad, felsefeyek e ku rizgariya giştî mirovahiyê ye. Felsefeyeke ku li dijî hemû ferasetên paşverû yên ku ji hêla pergala desthilatdar ve têne mezinkirin, têdikoşe. Lewma her ku hêza Rêbertî, ji hêla hêzên desthilatdar û dagirker ve hate naskirin, şêwazê komplo û pêkanîna wê mezin û berfirehtir bûye."

**'Dixwazin tolê jê hilînin'**

Xalis Misewer da xuyakirin ku bi girankirina tecrîda li ser Rêber APO, armanc ew e ku wî hêdî hêdî ji holê rakin û wiha domand: "Ev rêbazeke ku bi carekê de nakuje, her rojê hêdî hêdî dikuje. Li kêleka vê dixwazin her kesê bi Rêber Apo û doza azadiyê ve girêdayî, fêrî jiyaneke bêyî Rêbertiyê bikin û têkîliyên wî bi şopdarên meşa azadiyê û lêgerên heqîqetê re, qut bikin."
Xalis bîrxist ku Rêber Apo tevayiya veşartiyên desthilatdaran derxistiye hole û da zanin ku Dîrok, civak û jin her sê rastiyên ku Sistema deshilat ya zilam pê lîstibûn û berovajiya rastiyên wan dabûn nîşandan, Rêber Apo ji nû ve bidestgirt û got, bi derketina van rastiyan, derbeke herî mezin li desthiltdariyê hate xistin.

**'Tevahî mirovahî deyndarê Rêber Apo ye'**

Xalis Misewer diyar kir ku Rêber Apo bi fikir û ramanên xwe gelan ronak dike, bûye roja gelê Kurd û tevayiya mirovayiyê û wiha domand: "Berê gelê Kurd newêrîbû bi zimanê xwe yê Kurdî du peyvan bi dengekî bilind biaxive. Lê îro bi zimanê xwe dixwîne û doza mafê xwe dike, mînaka wê ya ber bi çav jî li Rojavayê Kurdistanê ye."

Nivîskar û rewşenbîrê Kurd Xalis Misewer bang li gelê Kurd û tevaiya gelên azadîxwaz kir ku ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî rabin ser piyan û bertekên xwe nîşan bidin û axaftina xwe wiha qedand : "Serkeftinên îro gelê Kurd bidest xistin e, bi saya Rêber Apo ye, divê gelê Kurd û tevayiya gelên azadîxwaz ji bo azadiya Rûber Apo têbikoşin. Tevayiya mirovayiyê dêndarê wî ne."



## Rêveberiya xweser bûye mînaka çareseriya li Sûriyê

**DILYAR CIZÎRÎ**

Piştî buhara gelan a ji Tunisê destpê kirî, derbasî Sûriyê bû. Gelê wê jî di 15`ê Adara 2011`an de ji bo guhertina demokratîk, çalakî dane destpêkirin û roj bi roj çalakiyên xwe berfireh kirin. Hikûmeta rêjîma Baas xwe li vê rewşê ranegirt û bi guleyan bersiva çalakvanan da û bi sedhezaran qetil kir.
Dewleta Tirk û hin aliyên din jî di nava vê rewşê de destê xwe avêtin şoreşa gel û xwestin ji bo berjewendiyên xwe û pêkanîna planên xwe yên dagirkeriyê, ketin tevgerê. Îcar ji bo vê derbarê bi sedan komên çete ava kirin û di hemû qadan de destê xwe avêtin nava karûbarê gelê Sûriyê.

Di rewşeke wiha de nîştecihên Rojava, tekoşîna xwe li ser esasê paradikmaya Netewa Demokratîk dan meşandin û di encamê de roja 19`ê Tîrmeha 2012`an yekem bajarê xwe Kobanê ji rêjîma Baas rizgar kirin. Bi şoreşa 19`ê Tîrmehê re bajar li pey bajarî hatin rizgarkirin û gel ji bo rêveberî û çareseriyên aloziyên xwe sazî û dezgehên taybet ava kirin.
Ev rewş heta 2014`an wiha bû, di 21`ê Çileya wê salê de Rêveberiya Xweser a herêma Cizîrê hate damezirandin û paşê li Kobanê û Efrînê jî rêveberî hatin damezirandin. Pê re jî êriş û dijberiya wê rêveberiyê mezin bû, heta çeteyên DAIŞ'ê êriş pêk anî û bi serkêşiya dewleta Tirk û hikûmeta Şamê, ji hemû aliyan xwest dawî li rêveberiya ku xwe dispêre bingeha hêza civakê û hevgirtina pêkhateyan, bîne.

Lê di wê rewşa êriş, dorpêç û tundiyê de gelek herêm hatin rizgarkirin û rêveberî hîn zêdetir hatin berfirehkirin. Ev jî bû sedema pêwîstiyeke din a avakirina Rêveberiyeke yekgirtî ya di nava hemû herêmên xweser ên Bakurê Sûriyê de.
Ji lewra di 6`ê îlona sala 2018`an de li Eyn Îsa jî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser mîrasê tekoşîna şoreşa 19'ê Tîrmehê û avakirina Rêveberiya Xweser a herêma Cizîrê hate ragihandin.
Edî hemû rêveberiyên heyî di bin banê wê de, kar û planên xizmetguzarî, rêveberî, siyasî û civakî didan meşandin. Aliyên dijber û di serî de dewleta Tirk û hikûmeta Şamê jî, bê navber dijberiya xwe dewam kirin û dest bi reşkirina rêveberiyê kirin. Herwiha îdaya parçekirina Sûriyê û qutkirina xaka wê xistin rojevê. Îro, ango piştî 4 salan rêveberiya Xweser bû mînaka çareseriyê ji hemû aloziyên heyî yên Sûriyê re.
Tevî hemû zor û zehmetiyên heyî û hemû kêmasiyên heyî jî, em dinerin rewşa heyî ya herêmên Rêveberiya Xweser ku di bin dorpêça aborî, şer û gefan de ye, ji hemû herêmên din ên Sûriyê baştire.
Em dibînin xelkên Siwêda û Idlibê jî, xweziya xwe bi pêkanîna sîstema Rêveberiya Xweser a xwe dispêre sîstema ne navendî ku mafê hemû pêkhateyan diparêze, dikin. Herwiha vê sîstemê bi hemû awayî karî mafê jinan biparêze û jinan di hemû qadên jiyanê de bike pêşeng.

Ji ber wê jî her kes êdî wê baş dibînin ku sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tekane mînak û riya çareseriya aloziya li Sûriyê û tevahî herêmê ye.



# 'PDK'e ji bo qirkirina Kurdan ji dewleta tirk re derfet ava dike'

Welîda Botî diyar kir ku armanca êrîşên dagîrkeriya tirkî yên ser çiyayên azad qirkirina Kurdan e û wiha got, dagîrkeriya tirkî di şerê li dijî hebûna Kurdan de, PDK'ê bikar tine û dixwaze di rêya wan de kurda di qirkirinekê dîrokî de derbaz bike.

**Şaho Gabar / Qamişlo**

Ji 17`ê Nîsana ve, artêşa Tirk a dagirker bi piştgiriya PDK`ê re li Başûrê Kurdistanê êrişî qadên gerîla dike. Di dema ku artêşa Tirk a dagirker çekên pêşketî, kîmyewî, qedexekirî û balafirên şer bi kar tîne, gerîla li Zap, Metîna û Avaşîn bi derfetên biçûk berxwedaneke bêhempa û dîrokî dide meşandin. Ji ber têkçûna dagîrkeriya tirkî li herêmên parastinê yên Medya, PDK'ê bi vekirina riyan li qadên gerîlayan dixwaze gerîla dorpêç bike û artêşa Tirkan ji têkçûnê xelas bike. Li ser kiryarên PDK'ê, herî dawî 28 tîrmehê NPG'ê jî hişyarî dabû PDK'ê ku dest ji daxwazên xwe yên derxistina serê navxweyî berde û herwiha banga PDK'ê kir ku ji hevkariya bi êrişên dagîrkeriyê re vegere.

Derbarê êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û xetera hevkariya PDK'ê ya li ser tevayiya Kurdistanê, Endama Rêveberiya Kongra Star, Welîda Botî ji me re axivî.
Welîda Botî diyar kir ku dewleta Tirkî bi qirkirina gelan xwe li ser lingên xwe girtiye û wiha domand: "Dewleta Tirk a dagirker di hebûna kurdan de tunebûna xwe dibîne, ji ber wê hewl dide ku bi çi awayî jî be, kurdan qir bike. Dagîrkerî tevayiya çekên giran û qedexekirî li hemberî girîlayên azadiyê bikar tîn e. Heta çekên nûkleerî jî bikar tîne. Armanca wê ji zêdekirina êrişan, şikandina îradeya girîlayên azadiyê û tevayiya Kurdên welatparêz e. Dixwaze parazvanê demokrasiyê û heqîqetê ji holê rake. Herwiha dixwaze têkoşîna ku li herêmên Medya ku bûye kelem li pêşiya dagîrkeriya, bişkên e."

**'Wekî her car îro jî PDK'ê ji dijmin re dibe amûr'**

Welîda Botî da zanîn ku di demên dawî de, PDK'ê bi awayekî eşkere hevkariya dewleta tirkî ya dagîrker kiriye û wiha got: "Dewleta tirkî ya dagirker di demên dawiyê de li herêmên Parastinê yên Medya derbên giran ji şervanên Azadiyê xwarin û gelek leşkerên wê hatin kuştin, tevî ku dagîrkerî bi tevayiya hêz û çekên qedexekirî êrişî ser qadên gerîlayan kir jî. Ji ber ku dewleta tirkî li hember berxwedana gerîla têkçû, car din PDK'ê bi xwe re tevlî şerê gerîla kir. PDK'ê jî rê ji Tirkan re vedike û alîkariya wan dike ku deskeftiyên kurdan giş bikevin destê dewleta tirk."

**'Em banga gelê Başurê Kurdistanê dikin ku xwedî helwest bin'**

Welîda Botî diyar kir ku hevkariya PDK'ê bi dewleta tirkî re, xetereke mezin li ser hebûna Kurdan çêdike û wiha got: "Dema dewleta tirkî li hember têkoşîna gerîla têk diçe, **PDK'ê bi xwe re beşdarî şer dike. Hevkariya PDK'ê bi dewleta tirkî re xetera şerekî di navbera Kurdan de çîdike. PDK'ê ji bo qirkirina Kurdan derfetekê ji dijmin re çêdike. Divê gelê Kurd û bi taybet yê başûrê Kurdistanê li hember hevkariya PDK'ê ya bi dagîrkeriya tirkî re xwedî helwesteke xurt be û li dijî wê dengê xwe bilind bike.**

**'Tevayiya planên dagîrkeriya tirkî li ser qirkirina Kurdan e'**

Welîda Botî balkişand ser hewldanên dewleta tirkî ji bo sûdgirtina ji rewşa Iraqa ya tevlihev û wiha axivî : "Di dema dawî de gelê başûrê Kurdistanê û gelêk aliyên Iraqî, li hemberî êrişên dagîrkeriya tirkî xwepêşandan li dar xistin û li dijî artêşa tirk ya dagîrker helwesta xwe nîşan dan. Bi tevlheviya rewşa Iraqê, dewleta tirkî ji xwe re firsetek dît ku êrişên xwe yên ser qadên gerîlayan zêde



bike. dewleta tirk hewl dide ku sûd ji guhertinên ku di cîhanê de çêdibin bigere û Kurdistanê bi giştî dagîr bike."

**'Têkoşîna Gerîlayên Azadiyê wê bi tîpên zêrên di rûpelên dîrokî de bê nivisîn'**

Welîda Botî da xuyakirin ku gerîla bi îradeya xwe ya xurt li hemberî teknîka wan ya herî pêşketî serkeftinan bi dest dixe û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Berxwedana gerîla ya li çiyayên Kurdistanê berxwedaneke dîrokî ye û dê bi tîpên zêrîn di rûpelên dîrokê de were nivîsandin. Dewleta tirkî ya dagîrker ji ber berxwedana bêhempa ya gerîla nikare gavekê pêş de biçe. Divê her mirovekî azadîxwaz li tevayiya cîhanê, piştgiriya berxwedana dîrokî ya gerîla bike, ji ber ku gerîla nirxên mirovayiyê diparêz e."

Endama Rêveberiya Kongra Star, Welîda Botî bêdengiya navneteweyî ya li hember êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li dijî çiyayên Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kir û axaftina xwe wiha qedand: "Divê civata navneteweyî û rêxistinên mirovî berpirsyariyên xwe yên li hemberî kurdan bi cih bînin û ji ber sûcên dewleta Tirk wê ceza bikin."

# Saleke nû ya xwendinê dest pê dike

**Bêrîtan Elî-Qamişlo**

**Li ser sala nû ya xwendinê, Hevseroka Desteya Perwerdê Rohat Xelîl da zanîn ku îsal ji aliyê perwerdekirina mamosteyan ve û çeksazkirina dibistana, heta astekî baş xebitîn.**

Bi destpêkirina şoreşa Rojava re, hemû hêzên serdest yên ku naxwazin gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî gelê Kurd, di cîhanê de bibin xwedî maf, bi hemû hewildanên xwe êriş dikin û serkêşê van hêzan jî dewleta tirk ya dagîrker e. Tevî êriş, gef û degîrkirina xaka bakur û rojhilatê Sûriyê ji aliyê dewleta tirk, gelê herêmê kar û xebata xwe didomîne û encama xebata wan dibe bersiva dijmin. Lewra girêdana wan bi xaka ku bi xwîna şehîdan hatiye avdan, heye.
Ji bo têkbirina planên dijmin ya herî girîng û pêwîst, xwedîderketina li zimanê dayîkê ye. Lewra civak bi zimanê xwe tê naskirin û çanda wê bi zimanê wê tê parastin. Ji bo perwerdekirina nifşê nû bi zimanê dayîkê, gelê Rojava bi destpêkirina Şoreşê re, tişta sereke parastîn û pêşxistin, zimanê dayîkê bû.
Sala xwendinê ya 2022-2023 li bakur û rojhilstê Sûriyê wê destpê bike. Tevî şert û mercên zehmet yê ku herêm têde derbas dibe, mamosteyên herêmê, bi hemû pêkhateyên xwe ji bo perwerdekirina xwendekaran, xwe amade dikin.

**Bi çeksazkirina dibistana pirsgirêkên salên borî çareser dibin**

Hevseroka Desteya Perwerdê ya Herêma Cizîrê Rohat Xelîl ji me re axivî û diyar kir ku, ji bo destpêkirina sala nû ya xwendinê amade ne.
Rohat axaftina xwe wiha domand: "Piştî li darxistina civîna giştî ya desteyên perwerdê yên bakur û rojhilatê Sûriyê biryar hat girtin ku, 11 Îlonê wê mamoste dest bi karê xwe bikin û 18 mehê jî wê dibistan fermî pêşwaziya xwendekaran bikin. Amadekariyên me ji bo sala nû ji aliyê perwerdekirina mamosteyan pir baş bû; hem mamosteyên ziman, hem jî yên biranşata. Jixwe peymangeha Şehît Egîd Çolî ku dewreya mamosteya ya 40 rojî berdewam e.``
Rohat Xelîl da zanîn ku plana wan ji bo sala nû ewe ku 136 dibistan werin çaksazkirin. Heta niha 77 dibistan tên çaksazkirin. Herwiha rêxistinên ku li vê derê bi cih bûne, wê 66 dibistana ji aliyê xwe çeksazbikin. Li gorî plana ku me daye pêşiya xwe, divê ji niha heta 5 salên din wê tevayiya dibistana werin çaksazkirin. Li ser guhertina navên dibistanan jî, Rohat got, di nav projeyên me de heye ku her taxek wê li ser navê şehîdê xwe yê yekê, were binavkirin.

**Biranşeke nû**

Li ser cudayiya di navbera îsal û salên borî de Rohat wiha got: "Îsal ji refê 4 heta 9`ê ji bo pêkhateyên ereb, pirtûka Ol amade ye. Ji bo pêkhateyên kurd jî tenê ji refa 4 heta 6 e. Lewra hêjî wergerkirin bidawî nebû ye. Herwiha ji bo xwendekarên civaka Êzêdî, tenê ji bo refa çar pirtûk amade ye. Îsal ji bo refên 11 û 12`e jî pirtûka Jinolojî hat amadekirin, li ser wê jî mamoste hatin perwerdekirin.``



Hevseroka Desteya Perwerdê ya Herêma Cizîrê Rohat Xelîl axaftina xwe wiha bidawî kir: ``Ji bo xwendekarên zanîngeha Rojava jî, yên xwendina xwe diqedînin li gorî pêwîstiya desteyê, her demekê pêşbirk têne çêkirin. Eger di ezmûnan de bi ser bikivin, deste wan fermî derbasî dibistanan dike. Zehmetiyên ku em dikîşênin peydakirina amûrên perwerdeyê ne. Sedemên van zehmetiyan jî derfetên kêm yên aborîne.``
Herî dawî Rohat Xelîl sala nû ya xwendinê li tevayîya mamost û xwendekaran pîroz kir û hêviya serkeftinê ji hemûyan re xwest.